Bawerî bi xwe, kêşe û giriftan nahêle

Berhevkirin:Arî Mihemed

Mirov wek bûnewerek ji biçûkatî têkiliyê li gel derdorên xwe dike, tûşî nexweşî û azaran dibe. Ev e tiştek bivê yan nevê ku çi mirov li ser goya zemînî bê arîşe nînin û her yek ji me têra xwe arîşe û nexweşî hene. Bo nimûne, hindek zarok hene ji ber giraniya barê jiyanê û ji bo peydakirina parê nanî, hêj ji zarokîniya xwe li ser kolanan kar dikin û di egerê de tûşî nexweşiyan dibin.

Hindek xêzan hene hêjmara endamên wan gelek in, lewra serokê wê xêzanê neşê pêdiviyên wan hemûyan dabîn bike, lewra ew jî bi rengek ji rengan tûşî nexweşî û azaran dibin û ….htd.

Lê, divê eve wê çendê negehîne ku em hebûna van rewşan bikine asteng û destan ji jiyana xwe dahêlin. Çûnke ew cûre rewşên jê hatine gotin her yek ji wan taybetmendiya xwe heye û hindek rewşên dî ji yek cudane û nabe em her xem û xefetan li ser hev kom bikin ku çi di şiyanên me de nîne û milkeçiyê bo wê rewşa aloz bikin û xwe bê rê bikin. Eve bi xwe dibe egerê hindê ku mirov xwevarê xwe ji nav civakekê bibîne û li dawiyê ev rewşe dê bibe egerê têkçûnên derûnî û saxlemiyê û mirov xwe lawaz dibe. Belê ya rast mirovê xwedan îrade, şiyan, hizreka rast û dirust bike û çi asteng û nexweşî neşên xwe li ser zal bikin û mirovê xwedan şiyan û îrade dikare riya xwe bi dirustî di nav astengan de vebijêre û jê re ya baş û rast bibîne.

Ev rewşa bas dikin dibe di nav texa xortan de bi şêweyekê ji şêweyan henin.

Di jiyanê de mirov tûşî arîşeyan dibe û eve jî yasaya jiyanêye û kesê bê xem û xefet nîne, lê ya giring ewe çi rê hene mirov xwe li ser arîşe û nexweşiyan de zal bibîne û riyên guncayî li ber çav werbigrin ji bo hindê ku eve rewşe li ser wî giran nebe û tûşî diltengî û bêzariyê nebe ku xwe bê rê bibîne û bighê pileya xwekuştinê.

Vêca rêyên kuncayî çi ne em wesa xurt li ber çav werbigrin ji bo hindê rewşa derûnî û saxlemî û civakî têk neçin, ew jî di van xalan de diyar dibin:

1-Bizavê bike demê xwe yê vala bi bizavên hunerî, werzişî, zanistî û edebî pir bike.

2-Pêdiviye mirov yê civakî be û xwe nêzîk xelkê û hevalan bibîne û ji wan veder nebe, çunke mirov bûnewerekê civakî ye û bê hebûna têkiliyan li gel xelkê dî jiyan ya bi zehmete.

3- Divê mirov yê rastgo be xwe di xewn û xeyalan de niqum neke. Çûnke nexweşî û kêşe bi xewn û xeyalan çare nabin.

4-Divê her dem mirovî bawerî bi xwe hebe ku xwedan şiyane û dişê gelek karan bike û mifayî ji şiyan û serborên xelkekî dî jî werbigre.